# MODELA ME YA RÊVEBERIYÊN XWECIHÎ YA AZADÎPARÊZIYA JINAN A TJAYÊ


TJA

TEVGERA JINÊN AZAD

# MODELA ME YA RÊVEBERIYÊN XWECIHÎ YA AZADÎPARÊZIYA JINAN A TJAYÊ

Wek kut ê zanîn, qada rêveberiyên xwecihî yek ji wan qadan e ku bandorê li tevahiya qadên jiyanê dike û bi civakê re herî zêde di nava têkiliyê de ye. nûneriya jinên ku nîvê civakê pêk tînin a di hilbijartinên xwechî de ji bo sepandina demokrasiya xwecihî xwediyê girîngiyeke jêneger e. Her çiqas ji aliyê pergalê ve ev qad wek qada mêran bê pênaskirin jî, bi ezmûna rêveberiyên xwecihî ya ji bîst salan zêdetir a Tevgera Jinên Kurd û bi xebatên hevpar ên bi Tevgera Jinên Tirkiyeyê re di gelek qadan de bi nûneriya jinê û nêrîn û feraseta jinê ya şaredariyan, gelek destkeftiyên mezin hatine bidestxistin.

Yek ji bingehên demokrasiya xwecihî ya sereke şaredarî ne. Ezmûna pêşîn a rêveberiyên xwechî beriya salên 1980'yî pêk hatiye. Di hilbijartinên rêveberiyên xwecihî yên sala 1979'an de, li navçeya Cirnê Reş a Rihayê jinên bi navên Durre Kaya, Saadet Yavuz û Emîne Haci Yusufoglu bûne ***endamên meclîsa şaredariyê yên pêşîn .***



*Dûrre Kaya*



*Saadet Yavuz*



*Emîne HacîYusufoglu*

Wek partî jî ezmûna rêveberiyên xwecihî di sala 1999'an de bi beşdariya hilbijartinên şaredariyê û meclîsên giştî yên bajaran dest pê kiriye. Di hilbijartinên sala 1999'an de bi navê HADEP'ê wek partî beşdariya hilbijartinan pêk hatiye.Di sala 1999'an de HADEP'ê sê herêm wek 'herêmên pîlot' diyar kirin da ku di hilbijartinên rêveberiyên xwecihî de cudakariya erênî bi awayekî aktîf teşwîq bike: Li Dêrik Eyşe Karadag, li Qosera Mêrdînê Cîhan Sîncar û li Bazîda Agiriyê jî Mukaddes Kubîlay hatin hilbijartin. HADEP li van bajarokan bi nûnerên jin beşdarî hilbijartinan bû û li her sê bajarokan jî şaredarî bi dest xist. Li Dêrik û Qosera Mêrdînê jî, li Bazîda Agiriyê jî ew cara pêşîn bû ku şaredarên jin hatibûn hilbijartin .



*Cîhan Sîncar*



*Eyşe Karadag*



*Mukaddes Kubîlay*

Di vê pêvajoyê de li Bazîdê navenda şêwrê ya jinan a yekemîn hat vekirin. Paşê ev navend bi navê "navendên hevgirtina jinan" li bajarên cuda jî hat damezirandin.

Di hilbijartinên 2004'an de hejmara şaredariyên ku hatin bidestxistin zêde bûn û bi tevahî 57 şaredarî hatin bidestxistin ku di nava wan de bajarên wek Amed, Êlih, Dêrsim, Colemêrg û Şirnexê jî hebûn. Êdî jinên Kurd bi berendamên ku wan hildibijartin beşdarî hilbijartinan dibûn. Di encama sererastkirinên erênî yên ji bo jinan a di lîsteyan de, hejmara berendamên jin ji 100'î derbas bûye. Hejmara şaredarên jin a ku di sala 1999'an de 3 bû, di hilbijartinên rêveberiyên xwecihî yên 2004'an de derket 9'an.

Di sala 2005'an de Partiya Civaka Demokratîk (DTP) bû partiya siyasî ya yekemîn ku Pergala Hevserokatiyê pejirand. Aysel Tugluka wek hevseroka pêşîn hat hilbijartin. Şaredariyên DBP'yê (Partiya Herêmên Demokratîk) yên ku paradîgmaya demokratîk, xwezaparêz û azadîparêziya jinê û felsefeya hevjiyana azad bingeh digirtin bi vê hişmendiyê gavekî mezin avêtin û di hilbijartinên 30'ê Adara 2014'an de, di rêveberiyên xwecihî de hevserokatî û nûneriya wekhev sepandin .

Di sala 2005'an de Partiya Civaka Demokratîk (DTP) bû partiya siyasî ya yekemîn ku ***Pergala Hevserokatiyê*** pejirand. Aysel Tugluka wek hevseroka pêşîn hat hilbijartin. Şaredariyên DBP'yê (Partiya Herêmên Demokratîk) yên ku paradîgmaya demokratîk, xwezaparêz û azadîparêziya jinê û felsefeya hevjiyana azad bingeh digirtin bi vê hişmendiyê gavekî mezin avêtin û di hilbijartinên 30'ê Adara 2014'an de, di rêveberiyên xwecihî de hevserokatî û nûneriya wekhev sepandin .

Di sala 2014'an de DBP bi pergala hevserokatî û nûneriya wekhev beşdarî hilbijartinên rêveberiyên

xwecihî bû. DBP'yê bi beşdariyeke bi hêz a jinan, di sala 2014'an de, di qada rêveberiyên xwecihî de serkeftineke mezin bi dest xist. Bi vê pergala ku cara pêşîn di rêveberiyên xwecihî de hevserokatî hat sepandin û hîna jî tê sepandin, DBP û HDP (Partiya Demokratîk a Gelan) hîna jî di tevahiya cîhanê de tekane partî ne ku vê yekê dikin.

Di vê çarçoveyê de; nûneriya jinan a di rêveberiyên xwecihî de ya li Tirkiyeyê, bi ked û berdêleke mezin a Tevgera Jinên Kurd, bi hilbijartinên 1999'an gihîştiye qonaxeke cuda. Pergala hevserokatiyê û nûneriya wekhev a ku bi ked û berdêlên mezin Tevgera Jinên Kurd sepandiye û ji bo me jêneger e; bûye mekanîzmaya herî girîng a ku hewl dide destkeftiyên jinan biparêze û van destkeftiyan mayînde bike.

Wek Tevgera Jinên Kurd; em dibêjin divê jinên ku nîvê civakê pêk tînin di tevahiya qadên jiyanê de bi awayekî wekhev bên temsîlkirin û em ji bo vê yekê têdikoşin. Em Pergala Hevserokatiyê û Nûneriya Wekhev wek pêdiviyeke kargêriya demokratîk a di rêveberiyên xwecihî de dibînin û em dibêjin ku ji bo vê yekê jî em ê heta dawiyê têbikoşin .



*Aysel Tugluk*

# DESTKEFTIYÊN JINAN ÊN HILBIJARTINÊN RÊVEBERIYÊN XWECIHÎ YÊN 2014'AN

Bi perspektîfa ku piştî hilbijartinên rêveberiyên xwecihî yên sala 2014'an hat diyarkirin meclîsên jinan ên şaredariyan hatin avakirin, lijneyên jinan û koordînasyonên jinan hatin hilbijartin. Her wiha "komîsyonên wekheviyê yên jin û mêran" ên ku ji jin û mêrên hilbijartî pêk dihatin û "komên jinan" hatin avakirin. Di sê şaredariyên bajarên mezin de (Amed, Mêrdîn û Wan) Serokatiyên Daîreyên Polîtîkayên Jinan, di şaredariyên bajar û bajarokan de jî Gerînendehiyên Polîtîkayên Jinan hatin damezirandin. Her wiha di binê banê van yekeyan de Gerînendehiyên Aboriya Jinan, Gerînendehiyên Têkoşîna Li Dijî Tundiyê yên Jinan, Gerînendehiyên Perwerdehiya Jinan û Navendên Hevgirtina Jinan hatin damezirandin. Dîsa di binê banê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê de ***"Îstasyona Gavê Yekem"*** û ***"Xeta Alo Tundî"***yê hatin avakirin. Ji ber ku ev sepan li Tirkiyeyê, di rêveberiyên xwecihî de sepana yekem û tekane ye gelekî girîng e .

Xalên ku jinê esas digirin li peymanên tomerî yên ku bi xebatkaran re hatin çêkirin de hatin zêdekirin. Di metnên peymanên tomerî yên ku bi karker û kedkaran re hatine çêkirin de nêzikatiya azadîparêziya jinê hatiye esasgirtin û 8'ê Adarê ji bo jinên kedkar wek betlaneya fermî hatiye daxuyandin. Têkoşîna bi bandor a li dijî tundiya li hemberî jinê li peymanan hat zêdekirin. Her wiha, biryara wergirtina tevahiya mafên xebatkarên mêr ên ku cureyên tundiya li hemberî jinê yên wek berdêl, hêwî, zewicandina di temenê biçûk de disepînin li peymanên tomerî hatiye zêdekirin.



# WEK AMÛREKE XESPÊ, SEPANÊN QEYÛMAN

Saziyên ku beriya hatina qeyûman jin û gel bi hêsanî diçûn, pirsgirêkên xwe dianîn zimên û çareser dikirin, veguherîn qadên ji civakê qut ên ku bi taybetî jin û bi awayekî giştî jî gel êdî naçe û nayê wan. Piştî ku DBP'yê di hilbijartinên xwecihî yên sala 2014'an de 102 şaredarî bi dest xistin, di Rezbera sala 2016'an de, ji bo 96 şaredariyên me qeyûm hatin şandin. Karê qeyûmên ku di sala 2016'an de hatin ê pêşîn ew bû ku xebatên jinan û xebatkarên jin ji xwe re kirin armanc û ew tasfiye kirin. 43 navendên me yên jinan ên ku bi awayekî çalak dixebitîn û stargehên di binê banê wan de bûn armanca pêşîn a qeyûman, xebatên wan hatin astengkirin û di dawiyê de jî hatin girtin. Bi dehan hevşaredarên me û endamên meclîsan jî hatin girtin. Gelek hevserok û hilbijartiyên me hîna jî di girtîgehan de ne. Hemû cureyên xebatên têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê yên ku li bajar û bajarokan dihatin kirin, xebatên şiyarkirinê û xizmetên me yên ku di çarçoveya têkoşîna jinê de dihatin kirin hatin 'îlegalîzekirin' û astengkirin. Navendên me yên jinan û qadên jiyana azad (stargehên jinan) girtin, xebatkarên Gerînendehiya Polîtîkayên Jinan an ji kar avêtin an jî cihê karê wan guherandin. Bi biryarên bi vî rengî xwestin ku têkiliya têkoşîna jinan û destkeftiyên wan a bi rêveberiyên xwecihî re rasterast qut bikin.



# HILBIJARTINÊN XWECIHÎ YÊN 2019'AN Û SERDEMA AVAKIRINA JI NÛ VE

Bersiva herî xurt a li hemberî bêdadiya ku bi darbeya qeyûman di sala 2016'an de hat dayîn, Hilbijartinên Rêveberiyên Xwecihî yên 31'ê Adara 2019'an bû. Li gor encamên fermî yên hilbijartinên 31'ê Adara 2019'an, HDP'yê 3 şaredariyên bajarên mezin, 5 bajar, 45 navçe û 12 jî bajarok, bi giştî 65 şaredarî bi dest xistin. Her wiha 1.230 endamtiyên meclîsên şaredariyan, 101 endametiyên meclîsên giştî yên bajaran bi dest xistin. Bi vî awayî pêvajoya avakirinê ya piştî tehrîbata sala 2016'an dest pê kir.

Di vê çarçoveyê de; heke bi awayekî kurt em xebat û çalakiyên ku ji sala 2019'an heta niha hatine kirin vebêjin; piştî hilbijartinên xwecihî yên 31'ê Adarê bi demeke kurt, di 65 şaredariyên bajar, navçe û bajarokan de; pergala hevserokatiyê, meclîsên jinan ên şaredariyan, lijneyên jinan ên di nava meclîsan de, koordînasyonên jinan, komîsyonên jinan, komîsyonên wekheviya jin û mêran hatin pêkanîn û damezirandin.

- ✓ Li tevahiya bajaran lijneyên jinan ên rêveberiyên xwecihî hatin damezirandin.
- ✓ Li her sê şaredariyên me yên bajarên mezin Serokatiyên Daîreyan ên Polîtîkayên Jinan hatin çalakkirin û dest bi xebatên xwe kirin. Her wiha di tevahiya şaredariyên me yên bajar û navçeyan de gerînendehiyên jinan hatin damezirandin .
- ✓ Ji bo navendên me yên jinan ên ku berê ji aliyê qeyûman ve hatibûn girtin an jî veguherandin pêvajoya hiqûqî hat destpêkirin. Ligel vê yekê gelek navendên jinan ên nû hatin vekirin û ji bo ku hinekên din jî bên vekirin gelek xebat hatin kirin.
- ✓ Di çarçoveya wergirtina kar a jinan de di binê banê gelek şaredariyên me yên bajar û navçeyan de gelek xebatên çalak ên wek kooperatîf, sera, qadên çandiniyê, bazara jinan, hwd hatin destpêkirin.



# XESPA QEYÛMAN A NÛ YA 19’Ê GELAWÊJA 2019’AN

-19’ê Gelawêja 2019’an wek darbeyeke siyasî ya nû derbasî dîroka Komara Tirkiyeyê bûye. Di dema ku pêvajoya avakirina ji nû ve didomiya de, piştî 5 mehan, darbeya qeyûman bi heman sepanên bêhiqûq dubare bû. Qeyûm şandin şaredariyên me yên bajarên mezin ên Amed, Mêrdîn û Wanê. Piştî hilbijartinên rêveberiyên xwecihî yên 31’ê Adara 2019’an, ji 19’ê Gelawêja ku qeyûmên pêşîn hatin şandin û vir ve, bi giştî 48 şaredariyên me ji aliyê qeyûman ve hatine desteserkirin, hevşaredarên me ji peywirê hatine dûrxistin. Ji 31’ê Adara 2019’an û vir ve 19 hevşaredarên me yên jin hatine girtin û ketine zindanan. Hevşaredarên me yên ku bi dengên gel hatine hilbijartin û nûneriya vîna gel dikin bi sedemên ‘qaşo’ yên ku di hiqûqê de tu wateya wan nîn e ji peywirê hatine dûrxistin. Yek ji hincetên tifaqa AKP û MHP’yê ya vê bêhiqûqiyê jî pergala hevserokatiyê ye. Sedema herî bingehîn a armancgirtina pergala hevserokatiyê rejîma mêrsalar a ku mêr ji xwe re dike bingeh e. Hevserokên jin û jinên hilbijartî bi boneya hevserokatiyê hatine krîmînalîzekirin, pergala hevserokatiyê bûye mijara dadgeh û darizandinan. Darizandin hîna jî didomin û gelek hevserokên me di vê çarçoveyê de ceza girtine. Bi van êrîşan armanca wan ew e ku pergala jinan a ku bi têkoşîna jinan di rêveberiyên xwecihî de hatiye avakirin ji holê rakin û bingeha hişmendiya yekparêz a mêrsalar careke din bi cih bikin. Bi hatina qeyûmên dawîn re, gerînendehiyên jinan û navenên hevgirtina jinan ên di binê banê 48 şaredariyên me de ya hatine pasîfîzekirin yan jî hatine girtin



# MOBÎNGA LI SER JINÊN A LI ŞAREDARIYÊN KU QEYÛMAN DESTESER KIRINE

Serokên daîreyan ên ku bi qeyûman re ji derve hatine dijminatiya Kurdan û jinan kirine û ji bo ku kedkarên jin nexebitin çi ji destê wan hatibe kirine. Qeyûman tevahiya jinên rêvebir bûne ji peywirê girtine û rêvebirên mêr di şûna wan de peywirdar kirine. Jinên ku li şaredariyan dixebitin bi sepanên kêfî hefteyê carekê sirgûnî yekeyên din an jî navçeyan kirine. Kedkarên ku li hemberî vê yekê derketine jî rûberî destdirêjiya devkî bûne, gef li wan hatine xwarin, cezayên dîsîplînê yên îdarî û kêmkirina mehmizan li wan hatine birîn û ji peywirê hatine dûrxistin. Di encama xebatên TUMBEL-SEN'ê yên rapirsînan ên piştî hatina qeyûman ên 2016 û 2019'an ên der barê mobînga li ser jinên ku li şaredariyên bajarên mezin ên Amed, Wan, Mêrdîn û Şaredariya Êlihê dixebitin de, gelek agahiyên girîng hatine bidestxistin. Ji %90'ê jinên ku beşdarî van xebatên rapirsînan bûne gotine ku palpiştiya qeyûman nakin, xebatên ku ji bo jinan tên kirin hatine astengkirin, wekhevî ji holê hatiye rakirin, bi awayekî azad nikarin fikr û ramanên xwe bînin zimên û rûberî mobîngê bûne.

Li gor encamên van rapirsînan;

- ✓ Xebatkarên jin ji şaredariyan hatine tasfiyekirin, ji bo îstîhdama jinan astengî hatine derxistin û di karbeşiyê de zayendparêzî hatiye kirin.
- ✓ Xebatkarên jin bi sepanên kêfî ji kar hatine derxistin, bi sedan jinên ku xebatên jinan dikin hatine îxrackirin.
- ✓ Jinên ku nehatine îxrackirin an jî ji kar nehatine avêtin di pozîsyonên herî bêkêr de hatine peywirdarkirin.
- ✓ Xebatkarên Navenda Jinan bi tenê di qadên alîkariya civakî de hatine peywirdarkirin.
- ✓ Li hemberî jinên ku di navendên jinan de dixebitin bi hincetên beredayî doz hatine vekirin û ceza hatine dayîn.

Heke em bi kurtasî hinek daneyên ku di van xebatan de balê dikişînin vebêjin; Li gor xebata rapirsînê ya ku bi jinên di gelek qad û warên cuda de xebitîne re hatiye kirin; ji ***%96***'ê xebatkarên jin ên şaredariyan palpiştiya hatine qeyûman nakin. Ji ***%92***'yê beşdaran gotine ku di şaredariyên ku lê dixebitin de, di peywirdarkirina jinan de rêgeza wekheviyê nayê sepandin; ji ***%74***'ê wan jî piştî hatina qeyûman li derveyî yekeya ku tê de xebitîne hatine peywirdarkirin. Jinên ku li derveyî yekeya xwe hatine peywirdarkirin, wek sedema bingehîn a guherandina cihê wan ê kar du tişt anîne zimên; ji ***%62,2***'yê wan gotine "Rêveberiya qeyûm xwestiye bi awayekî fiîlî wan ceza bike an jî ji bo ku wan çavtirsî bike ew şandine". Ji ***%88***'ê beşdaran pirsa "Gelo di şaredariyên ku qeyûm bi rê ve dibin de hawirdoreke ku hûn bi hêsanî fikr û ramanên xwe bînin zimên heye?" wek "Na" bersivandine. Ji ***%83***'yê beşdaran jî pirsa "Gelo piştî hatina qeyûman, li cihê karê xwe hûn qet rûberî mobîngê bûn?" wek "Erê" bersivandine. Her wiha pirsa "Gelo di van 5 salên dawî de, li cihê karê xwe, hûn qet rûberî tundiyê bûn?" jî ji beşdarên vê lêkolînê hatiye pirsîn. Dîsa rêjeyeke mezin, ji ***%95***'ê beşdarên lêkolînê ji vê pirsê re gotine "Erê". Di nava kesên ku bersiva "Erê" dane vê pirsê de, ji ***%85,3'***yê wan gotiye ez rûberî "Tundiya Psîkolojîk" bûme, ji ***%74,7***'ê wan gotiye ez rûberî "Gefa bêkarmayînê/ guherîna cihê kar" bûme, ji ***%63,2***'yê wan gotiye ez rûberî "Tundiya Devkî" bûme, ji %56,8'ê wan gotiye ez rûberî "Tundiya sirgûnbûnê" bûme, ji ***%30,5***'ê wan gotiye ez rûberî "Tundiya bi şantaj û blofê kar û livên ku min nedixwest bi min dane kirin" bûme, ji ***%3,2***'yê wan gotiye ez rûberî "Tundiya Zayendî/ destdirêjiyê" bûme û ji ***%1,1'***ê wan jî gotiye ku rûberî "Tundiya fîzîkî" bûme. Ji ***%37***'ê beşdarên vê rapirsînê jî bersiva "Erê" dane pirsa "Gelo tu piştî hatina qeyûman ji kar hatî avêtin? An jî heke ku tu karmendekî bi peyman bî, gelo peymana te hat betalkirin".

# PIŞTÎ QEYÛMAN LI KURDISTANÊ TÊKOŞÎNA LI DIJÎ TUNDIYA LI HEMBERÎ JINÊ

Qeyûmên ku di serdema Rewşa Awarte (OHAL) de bi daxuyandina KHK'yan (Biryarnameyên bi Hukmê Zagonan) şandin şaredariyan navendên şêwrê yên jinan ên di binê banê şaredariyan de girtin an jî bêhêz kirin. 3 stargehên jinan ên şaredariyên Amedê hatin girtin û xebatên wan hatin bidawîkirin. Her wiha qadên jiyana azad (stargehên jinan) ên Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê jî ji aliyê qeyûm ve hatin girtin. Piştî tevahiya navendên ku li bajarên Kurdistanê ji ber pêvidiyan hatibûn vekirin hatin girtin, dema ku jin rastî tundiyê werin tu navendên şêwrê yan jî stargehên jiyanê yên ku serî lê bidin nemane. Hejmara mirinên bi guman û kuştinên jinan nayê zanîn. Di serdemekê de SCS (Saziyên Civaka Sîvîl) ên têkildar nikaribûne çavdêriyan bikin, di raporan de cih bidin van hejmaran û xebatên rêgirtina li ber kuştinan jî hatine astengkirin.

Ji ber ku navendên şêwrê û SCS ên ku xebatên bergiriya li tundiyê û têkoşîna li dijî tundiyê ya li hemberî jinê dikin hatin girtin, di sala 2018'an de li Amedê Komeleya Jinan a Rosayê hat damezirandin. Ji roja ku Komele hatiye damezirandin ve, bûye navendeke gelekî girîng ku hem bi rêya çapemeniya dîjîtal û hem jî bi serlêdanên rû bi rû gelek kesan xwe gihandiyê. Ji ber ku ji tevahiya van serlêdanan re nikaribûye bi tena serê xwe bibe bersiv, bang li tevahiya SCS kiriye û Tora Têkoşîna li Dijî Tundiyê ya Amedê hatiye damezirandin.

Tora Têkoşîna li Dijî Tundiyê car bi car nûsafan dadixuyîne. Li gor van nûsafan, di 5 salên dawîn de, li Amedê, 7950 jinên ku bi tundiyê re rû bi rû bûne serî lê dane. Di 4 salên dawîn de 31 jin hatine qetilkirin. 21 jî mirinên jinan ên bi guman çêbûne. Dîsa di sala 2020'an de li Wanê Komeleya Jinan a Starê, li Mersînê Komeleya jinan a Mîmoza û li Amedê jî Komeleya Rosayê hatin damezrandin.

Li gor daneyên Komeleyê, di sala 2022'yan de, li Wanê û navçeyên wê 50 serlêdanên jinan ên li vê komeleyê çêbûne. Komeleyê şêwirmendî û piştgiriya hiqûqî û derûnî daye van serlêderan. Têkçûna civakî ya ku bi polîtîkayên qeyûmên rêveberiyên xwecihî çêbû, bû qada xebatê û têkoşînê ya rasterast a van komeleyan. Piştî ku navendên jinan û stargehên jiyanê hatin girtin, bûyerên tundiya li hemberî jinê, kuştinên jinan, mirinên bi guman û xwekujiyên jinan roj bi roj zêdetir bûn. Girtina mekanîzmayên ku piştgiriya civakî didin, kiriye ku bi taybetî jî pêdiviyên aborî û civakî yên jinên ciwan hatine astengkirin. Bi rêbazên cuda yên polîtîkayên şerê taybet, bi awayekî rasterast an jî li ser platformên dîjîtal li hemberî jinên ciwan tundî hatiye pêkanîn. Li bajaran bi destê hêzên paramîlîter, bi rêya fuhûş û tiryakê anomiya civakî tê afirandin. Bi polîtîkayên bêcezahiştinê mêr tên teşwîqkirin. Îro gelek jin serî li komeleyên li tevahiya bajar û herêman ên ku di qada tundiya li hemberî jinê de têdikoşin didin. Navendên ku dê berê jinan bide wan tune ne. Berê wan didin qereqol û ŞONÎMan (Navendên Bergirî û Çavdêriya Tundiyê). Ji ber ku Peymana Stenbolê hatiye feshkirin û xala 6284'an bi awayekî çalak nayê sepandin, saziyên fermî yên heyî li herêmê nikarin çareseriyan biafirînin. Li gor nûsafên her du komeleyên ku li herêmê dixebitin û Tora Têkoşîna li Dijî Tundiyê;

✓ Jin baweriya xwe bi hêzên ewlehiyê û saziyên fermî naynin, serî li komeleyan didin.

✓ Di serlêdanên li qereqolan hatine kirin de hatiye dîtin ku şert û mercên fîzîkî yên qereqolan ji bo ku jin bikaribin xwe bi awayekî baş îfade bikin ne guncan in, karmendên polês ne xwediyê wê formasyonê ne ku bikaribin bi jinên trawma jiyane re biaxivin, polêsên mêr gotinên ku kiryarê tundiyê mafdar nîşan didin dibêjin û hewl didin ku jinan ji bo vegera malê qanî bikin.

✓ Jinên ku jiyana wan di xetereyê de ye beraliyî stargehên di binê banê ŞONÎM'an de dikin. Hema bibêje tevahiya jinên ku çûne stargehan herî zêde dikaribûne 3 rojan li wan deran bimînin. Jinên ku serî lê dane xwestine ku li stargeha Weqfa Banê Mor bimînin.

✓ Piraniya jinên ku li bajarên Kurdistanê hatine qetilkirin ligel ku biryarên tedbîrê hebûne jî, ji ber ku nehatine parastin, hatine qetilkirin. Jin, di şûna ku li stargehan bimînin de vegeriyane malên xwe yên ku jiyanên wan di xetereyê de ne.

***Wek Encam;***

Şandina qeyûman li Tirkiyeyê darbeya herî mezin a ku li demokrasiya xwecihî hatiye xistin e. Qeyûm êrîşeke bîrdozî ya li hemberî ezmûn û danehevên bi salan ên ku Tevgera Jinên Kurd di encama berdêlên giran de bi dest xistine ye. Biryarên ku qeyûman li şaredariyan li hemberî jinan dane, dişibin hişmendiya polîtîkayên hukûmata AKP'yê ya ku li hemberî jinan disepîne. Karê pêşîn ê qeyûman ew bûye ku xebatên jinan û xebatkarên jin ji xwe re kirine armanc û ew tasfiye kirine. Polîtîkayên li dijî jinan ên qeyûman ji bo dilsoziya wan a bi hukûmata AKP'yê re bûne wek peymaneke hevpar.

Ji şandina qeyûmên ku vîna xwecihî xesp kirine re pergala hevserokatiyê kirine hincet. Ev yek jî hem êrîşeke desthilatdariya polîtîk a mêrsalara a li hemberî vîna civakê ye hem jî li hemberî destkeftiyên jinan e. Ji ber vê yekê, pir zelal e ku şandina qeyûman destwerdana li hemberî şiyariya wekheviya zayendî ya ku roj bi roj di nava civakê de xurtir dibe û veguherîna di vê qadê de ye. Lê Tevgera Jinên Kurd, ligel tevahiya êrîş, bergirî û deswerdanên ku li hemberî wê tên kirin jî, bi gotin û kirinên xwe diyar dike ku di pergala hevserokatî û nûneriya wekhev de bi israr e û diparêze.

Heke ku mirov polîtîkayên qeyûman bi tenê wek êrîşeke li hemberî destkeftiyên Tevgera Jinên Kurd û gelê Kurd binirxîne, ev tê wê wateyê ku haya mirov ji planên stratejîk ên desthilatdariyê tune ye. Ev hişmendiya xespker bi tenê ne pirsgirêka Tevgera Jinên Kurd e; ew pirsgirêka tevahiya jinên aştîxwaz ên ku jiyana azad diparêzin e. Parastina destkeftiyên jinan, bidestxistina destkeftiyên nû bes bi têkoşîna hevpar a jinan dê pêkan be. Têkoşîna hevpar, berxwedan û tifaqa jinan dê dawiyê li hişmendiya xespker a qeyûman bîne .




*Jin Jiyan Azadî*

*Tevgera Jinên Azad (TJA)*